Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1172 | 26-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165

# Li Dorşînê bihar bi Guldexwînan re hat



Guldexwîn a ku li quntara Çiyayê Dorşînê mezin dibe, bi îhtişama xwe re hemû kesan efsûn dike.

Li gelek deverên Kurdistanê bi hatina werza biharê û helîna berfê re Guldexwînan bi taybetî çiyayan bi tonên bêhempa yên zer, sor û kesk boyax dike. Yek ji cihên Guldexwînên ku kesên vê dibîne efsûn dike vedibe, quntara Çiyayê Dorşînê ya navçeya Pasûr a Amedê. Şahiya dîtbarî ya Guldexwînên a li qûntara çiyê, dê mehek bidome.

çiyê de jî, di mehên biharê de bi sedan Guldexwîn vedibe. Guldexwînên ku ji bo parastina xwe di navbera daran de vedibe û bi rengên xwe yên zindî re ji dûr ve jî tê dîtin, îhtişama xwe zêde dike. Welatiyên ku ji bo xwe bigihînin guldexwînan neçarin rêyek dirêj derbas bibin, di vê rêwîtiyê de dibin şahidê gelek bedewiyên Kurdistanê jî. Guldexwînên di objektifên me de dîmenên kartpostal derdikevin holê, tê payin guldexwîn bi germbûna hewayê re bicilmîse.

### Çiya hezar û yek dewlemendî di nava xwe de dihewîne

Çiyayê Dorşîn a li gundê Eskar a di navbera Pasûr û Zozana Şênê de cih digre, bi xwe ya ku em navê wê ji stranan dibihîsin re ji aliyê hemû kesan ve tê zanîn. Çiyayê Dorşînê ku bi Andok û Çiyayê Spî re di heman herêmê de cih digre, bi kulîlk û giyayên tendurist ên di nava xwe de dihewîne re cihê ku gelê herêmê pir zêde serdana wê dike ye. Çiyayê Dorşîn a ku welatiyên navçeyê û parêzgehên derdorê jî di her biharê de ji bo komkirina giyayên Rêvaz û Zuzaxê tên, bi rêyên xwe yên bikaş û girên rast hemû kesê qebûl nake.

### Bi sekna xwe ya estetîk û rengên xwe re bala hemû kesê dikşîne

Di bin siya her darê li qûntara

### Tehrîbat ranaweste!

Tehrîbatên ku di salên dawî de li herêmê em bi bedewiyên wê yên xwezayî behs dikin jî, bênavber berdewam dike. Bi hinceta ewlehiyê re li herêmê gelek qereqol û fotokapan hene, derket holê cerdevan û leşkerên ku derketin operasyonê piraniya darên li herêmê dibrin. Ji havîna sala borî vir ve li quntara Çiyayê Dorşînê û li derdora Çemê Qulpê birîna daran diqewime, di mehên havînê de li herêmê gelek caran agahiya şewata daristanan jî di çapemeniyê de cihê xwe digre. Dîsa ji ber 'herêma ewlekariya taybet' hat ragihandin, gelek caran ketina herêmê qedexeye. Çiyayê Dorşîn a li dijî tehrîbata tê jiyîn ji îhtişama xwe tiştek winda nekiriye, niha jî bi guldexwînên xwe re dewlemendî li derdora xwe zêde dike.

# Zarokên Efrînê bi stiraneke xwe şehîdên HRE'yê bi bîr anîn

Navenda Nûçeyan



Ruxmî êş û azarên herêmên Şehbayê û bombebaranên rojane, zarokên koçber ên Efrînê ji bo bîranîna şervanên Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) yên li gundê Basila şehîd bûne, sirûdek çêkirin.

Mûzîk û stiran bûne du tiştên ku êş û azarên koçberên Efrînê derbirîn dikin. Şêniyên Efrînê êşên xwe bi riya stiran û helbestan tînin ziman û bi vî rengî şehîdên xwe bi bîr tînin. Hunera xwe bi hewlên xwe yên takekesî diparêzin.

Du zarokên bi navê Yûsif Ebdulrehman û Yara Ebdulrehman ên xwişk û birayên hev, bi stiran û fêrbûna mûzîkê hem şehîdên xwe bi bîr tînin û hem jî çand û hunera xwe diparêzin. Zarokê 13 salî Yûsif Ebdulrehman ê ji gundê Kerzêla yê dagirkirî diyar kir ku wî stranek ji bo Hêzên Rizgariya Efrînê û bi taybet ji bo şehîdên gundê Basilê yên di şer û pevçûnan de şehîd bûne, çêkir. Yûsif diyar kir ku ev stran xwedî wateyeke mezin e û tê de têkoşîna Hêzên Rizgariya Efrînê û berxwedana wan a dîrokî tîne ziman.

Yûsif di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em hêvîdar in ku em vegerin Efrînê û wê ji terorê rizgar bikin. Hêzên Rizgariya Efrînê (HRE) ji bo me hêviyeke mezin e."

ji kamîreya : Hemze Sêvo



## FERHENGA BIWÊJAN

**Ronahiya çavê min e:**
- Min jê hes kir; min ji kirinên wî hes kir; keyfa min ji gotina wî re hat.

**Teyrê xerîb/teyrê xerîb te û van deran:**
- Te xwe pir xerîb kir; tu pir dereng têyî serdana me.
(Dema xizimek, yan dostekî yekî dereng diçe serdana wî jê re tê gotin)

**Li ser tirsê**

**Ava çeman disekine/avên çeman disekinin:**
- Jê ditirsin.
*Tirsa gundiyan ji tiştekî nîne, lê dema mijar tê ser axê avên çeman disekinin.

**Avêt teşkan:**
- Bêziravo emirdirêjo.
- Kesê xwe nede deverên bixeter tiştek pê nayê; kesê camêriyê neke zererê jî nabîne.

**Bila ziravê min ji pisîkê re be ziravê pisîkê ji min re be:**
- Bila tiştek neyê serê min, bila karê min têkûz be, bila ez tirsonek bim.
- Pir tirsiya.

**Bin xwe tijî kir:**
- Pir tirsiya; êdî nizaniya çi bike.

**Bû lepek:**
- Pir tirsiya; êdî desthilanîn jê çênebû.

**Bû pisîk:**
- Bi heman wateyê.
Bûn weke kewên tifing li ser wan

**teqiyayî:**
- Pir tirsiyan; ji hev tert û belav bûn; her yek bi cihekî ve çû.

**Cegerê mişk e:**
- Pir tirsonek e.

**Çokên min şkestin:**
- Ez pir tirsiyam.

**Çokên min fis bûn:**
- Bi heman wateyê.

**Dayê, ewa tu dibêjî min li der daye:**
- Tişta tu jê ditirsî ji zû ve qewimiye.
(Dayîk ji keça xwe re dibêje, hay ji xwe hebe xirab pir in, keça wê dibêje, dayê, ewa tu dibêjî min li der daye)
Dema piçûk ji mezinan ditirsiyam,

**mezin bûm ji piçûkan ditirsim:**
- Ji bo kesê her tim di tirsê de tê gotin.

**Dema şêr digere rûvî bi ser kuna xwe ve nabe:**
- Ji bo kesê tirsonek tê gotin.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî


## 'Di serlêdanên partiyan de mijara sereke azadiya Rêber Apo ye'



Berdevkê Insiyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan, Ferzende Munzir diyar kir ku heya niha serdana bêtirî 20 partiyan hatiye kirin. Ferzende da zanîn ku armanca insiyatîfê rolpêdana partiyan di Pêngava Azadiya Rêber Apo de ye û wiha got: "Partî giranîbûnê didin azadiya Rêber Apo û serdanên ku tên kirin. "R-4

## 'PDK'ê ji dengê rastiyê ditirse'

Rojnamevanên Ajansa Mezopotamiyayê diyar kirin ku PDK'ê bûye partiyeke ku li herêmê xizmeta berjewndiyên dewleta Tirk û dijminatiya gelê Kurd dike, herwiha ji dengê rastiyê ditrse û rojamevanên azad dike armanc.R-3



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1172 | 26-Gulan-2024 | www.ronahi.net/ku/

# EM Ê BI DENGÊ XWE SIBEROJA XWE XÊZ BIKIN

Hevserokê Partiya Kesk a Demokrat Luqman Ehmê diyar kir ku dema hilbijartin hatin ragihandin ew ketin tevgerê de û got: "Em ê keda xwe bi rengekî demokratîk bi kar bînin, êdî pirojeya Rêveberiya Xweser di aliyê siyasî de jî wê were erêkirin, ji ber vê yekê em hilbijartinan wekî têkoşîna ji bona demokrasiyê dibînin."R-5





## 'Saleke dagirtî bi berhemên hunerî ji çanda hemdem û kevnar'

Rêvebera Hunergeha Welat, Rozelîn Dêrik da zanîn ku sala 2024'an dagirtî ye ji berhem û stranên ji çanda hemdem û kevnar. Di heman demê de diyar kir ku wê stranek ji bo hilbijartinên şaredariyan û yên Partiya Siberojê, stranek girêdayî zimanê kurdî û mozîkjenên kurd di dema pêş de derkevin.R-7



## Hijmara jinên ku di salekê de li Tirkiyê hatin kuştin!



Li gorî rapora Federasyona Komeleyên Jinan a Tirkiyeyê, rapora kuştina jinan a di sala 2023'an de bûye sedema fikaran. Di salekê de 438 jin hatin qetilkirin; Ji van jinan 196 bi çekan, 86 bi amûra birîn, 36 jin bi ketina ji bilindahiyê, 17 jin jî bi xeniqandinê hatine kuştin. Sedema mirina 103 jinan jî weke 'gumanbar' hatin qeydkirin.R-2

## Mirov û Jîngeh



Rêveberê Komeleya Keziyên Kesik a Jîngehî Zîwer Şêxo diyar kir ku pêwîste bi rihê berpirsiyartiyê mirov nêzî Jîngehê bibe, jiyaneke bi tendiroştî ava bikin û wiha got: "Parastina jîngehê û paqijkirina derdorê pir lawaz maye, ji ber vê yekê pêwîste her mirovek çanda parastina jîngehê û paqijiyê di jiyanan xwe de pêş bixe."R-6



Dadgehên tunekirina kurdan
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# Hijmara jinên ku di salekê de li Tirkiyê hatine kuştin

Li gorî rapora Federasyona Komeleyên Jinan a Tirkiyeyê, rapora kuştina jinan a di sala 2023'an de bûye sedema fikaran. Di salekê de 438 jin hatin qetilkirin; Ji van jinan 196 bi çekan, 86 bi amûra birîn, 36 jin bi ketina ji bilindahiyê, 17 jin jî bi xeniqandinê hatine kuştin. Sedema mirina 103 jinan jî weke 'gumanbar' hatin qeydkirin.

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Jinên ku di sala 2023'an de hatîn kuştin**

Federasyona Komeleyên Jinan a Tirkiyeyê (TKDF) eşkere kir ku di sala 2023'an de di navbera 1'ê Çile heya 31'ê Berfanbara sala 2023'an de 438 jin hatin qetilkirin. Hat ragihandin ku jinên di sala 2023'an de hatine qetilkirin 180 jin zewicî bûn, 102 jin bi tena serê xwe bûn, 27 jin berdayî bûn. Her wiha diyar bû ku ji jinên hatine qetilkirin rewşa 117 ji wan nehatiye zanîn. Ji wan zilamên ku jin kuştine nasnameya 7 kesan nehat tespîtkirin. 135 gumanbarên jin ji aliyê mêrên ku nas dikirin ve hatin kuştin, 14 ji aliyê mêran ve têkiliya keç, xwişk û dayika wan pê re hebû, 69 ji aliyê endamên malbatê ve bû. 69 ji aliyê mêrên ku di pêvajoya berdanê de bûn û 115 jî ji aliyê mêrên ku jin bi wan re di nava têkiliyan de bûn, hatin kuştin.




**Kuştina jinên ku di çapemeniyê de cih digirin**

Di sala 2023'an de jinên ku di çapemeniyê de cih girtin, di navbera 1'ê Çile û 31'ê Kanûna 2023'an de 438 jin hatin qetilkirin. Di sala 2023'an de dewleta Tirk di nav 146 welatan de, di rêza 124'an de ye, ku di zêdebûna kuştina jinan de berdewam dike. Her wiha di nav 438 jinên kuştî de 135 jin mirina bi guman bû û 303 jê bi kuştinê hatine tomarkirin.

Dema em li rewşa zewaca jinên di sala 2023'an de hatin qetilkirin dinêrin; Wêneyê kuştina jinan derdikeve holê.

Ev yek neheqiyeke mezine di derheqê jinê de tê kirin, em di wê baweriyê de ne ku daneyên ku li ser mijarên wekî zewaca di temenê biçûk de, asta perwerdehiyê, xizanî, rewşa koçberiyê û temen de hatine bidestxistin, dê wekî polîtîkayek pêşîlêgirtinê encamên baş derxe holê. Di heman demê de Peymana Stenbolê ya ku di sala 2021'an de bi yek îmzeyê hat betalkirin, di rastiyê de li ser çar stûnan hatiye avakirin: pêşîgirtin, parastin, darizandin û polîtîka.

**Jinên ku di sala 2024'an de hatin kuştin**

Di Çileya 2024'an de 31 Jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin, 21 jin jî bi rêyên bi guman mirî hatin dîtin.
Di Sibata 2024'an de 36 Jin ji aliyê mêran ve hatin qetilkirin, 17 jin jî bi rêyên bi guman mirî hatin dîtin.

Têkoşîna ji bo rawestandina kuştina jinan li Tirkiyeyê ev 14 sal in didome. Weke platformê, ji sala 2010'an û vir ve pêwîstî bi vê helwestê hebû, her wiha Federasyona Komeleyên Jinan hertim vê daneya kuştina jinan ji raya giştî re eşkere dike. Mixabin, wezaret bi awayekî sîstematîk daneyên kuştina jinan diparêzin û parve nakin.

**Bêdengiya dadgehê rê li ber qetilkirina jinan vedike**

Ji bilî ravekirina rastiya kuştina jinê û mirinên bi guman ên jinan, ji bo rawestandina kuştina jinan jî peywira dewletê ye ku pêşniyarên çareseriyê yên berbiçav pêk bîne. Wê her tim jin têkoşîna xwe bidomînin da ku hemû wezaretên têkildar û hemû mekanîzmayên ji bo pêkanîna vê erkê seferber bikin. Di meha Adarê de 25 kuştinên jinan pêk hatin û 21 jin jî di nav şert û mercên bi guman de mirî hatin dîtin.

Ji 25 jinên hatin qetilkirin 3 jî bi hêncetên weke hevberdanê, aşitî û ne qebûlkirina wan ji zewacê re û 1 jî bi hincetên aborî hate qetilkirin. Sepandina cezayên astengkirinê, nepêkanîna tedbîrên pêşîlêgirtinê û qebûlkirina hincetên kuştinê ji aliyê dadgehan ve jî dibe sedema zêdebûna şidetê.

# Yekem jina ku li Reqayê karê emlakê dike

**Yekem jina ku li Reqayê karê emlakê dike Nur Al-Sanagh diyar kir ku dema li maleke kirê digeriya zehmetiyên ku kişandine, bûne sedem ku ji bo xwe ofîsa emlakê veke û da zanîn ku divê beşdariya jinan di jiyana kar de zêdetir bibe.**

Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê bi pêşengiya jinên li Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê, pêvajoyeke nû destpêkir û jiyana civakê guherand. Sîstema Rêveberiya Xweser ku bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk a Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat esasgirtin, ji bo gelên cîhanê bû mînak û hêvî berdewam dike. Di pêvajoya ku gelê Ereb, Kurd, Tirkmen, Çerkez, Ermenî û Sûryaniyan de gelek destkeftiyan bi dest xistin de, destkeftiyên herî mezin jinan bi dest xistin. Jinên ku di hemû warên jiyanê de îradeya xwe derxistin holê, li bajarên xwe gavên baş avêtin. Yek ji van jinan jî Nur Al-Sabagh e, bi vekirina ofîsa emlakê li Reqayê bû yekem jina karê emlakê dike.



**Dema li mala kirê digeriya bû emlakfiroş**

Nur Al- Sabagh ku bi eslê xwe ji bajarê Humus ê Sûriyeyê ye û di sala 2011'an de hatiye Reqayê, dayika 3 zarokan e, da zanîn ku fikra vekirina ofîsa emlakfiroşiyê çavkaniya xwe ji dema ku li mala kirê digeriya zehmetiyên ku kişandine girtiye û wiha got: "Dema ez li malan digeriyam, diçûm li ku rastî nêzîkahiyên biçûkxistinê dihatim. Vê yekê jî min bi avakirina karê xwe bi xwe ve bir. Min navê "Şêrê jin" lê kir ji ber min xwest hêza jinan were sembolîzekirin. Ez li gelek hevpîşeyên xwe geriyam û min agahî girt. Beriya 8 mehan jî belgeya rêvebirinê kerta 'esnaftiyê' min derxist. Derxistina vê kertê ji milê min ve hesan bû."

**'Civakê di gelek waran de qalibên ji ber zihniyeta paşverû çêbûne şikandiye'**

Nur Al- Sabagh bi gotinên; "Civak difikire ku di vê pîşeyê yan jî di pîşeyek din de mafê min ê karkirinê nîn e" Zextên civakê yên li dijî xwe wiha vegot: "Ez ji heqê wan hemû zehmetiyan derketim. Dema ku herêm di bin kontrola DAIŞ'ê de bû, li hemberî jinan me zext û bêedaletiyê dît. Ji ber zihniyeta mêrsalarî jî me demên gelek zehmet derbas kirin. Civakê qalibên vê zîhnyetê di astek girîng de derbas kir, lê hê bandora wê heye û li hinek cihan didome. Jin bi xebatê dikarin gelek tiştan bi ser bixin. Rexneyên civakê ez motîve kirim. Di roja yekem a vekirina ofîsê de min peymana yekem îmze kir. Vê yekê jî cesaret da min û ji bo berdewamiya wê ez motîve bûm."

**'Ez niha jinên kirêdar zêdetir fam dikim'**

Nur Al-Sabagh diyar kir ku eleqeya jinan ji ofîsa emlakê re heye û wiha domand:
"Ji ber ku jin muameleya baş û rûyê bi ken dibînin, eleqeyek zêde nîşan didin. Weke jin em hev fam dikin. Ez li cihên ku zêdetir kirêdarên jin hene kar dikim. Ji ber min jî heman tişt jiya ez wan pir baş fam dikim. Ketina xefika ofîsên emlakan çi ye ez fam dikim. Ji derveyî xebatê ez dayik û jina malê me divê jin bi hêz û îrade bin. Em di sîstemeke ku rola jinan zêde ye de dijîn. Ez li pey pêşketinê me. Divê jin zextên civakê ji bo xwe weke motîvasyona pêşketinê bibînin û bê tirs gavan biavêjin."

**'Kesên têdikoşin ên herî bi hêz in'**

Xebatkara ofîsa emlakê Hanadî Muhammed jî anî ziman ku dema daxwaza xebatê hatiye gelek bi heyecan bûye û got: "Vekirina ofîsa emlakê ji aliyê jinan ve gaveke nû ye û ji bo me girîng e. Piştî min dest bi kar kir, rastî bertekan hatim lê vê yekê cesareta min neşikand. Min ev bertek berovajî kir û weke motîvasyon dît, riya xwe berdewam kir. Divê jin di kîjan şert û mercan de bin, bila bin, bêhêvî nebin. Xebata min di ofîsa emlakê de baweriyek mezin da min. Êdî min got ez jî heme. Kesên têdikoşin, kesên herî bi hêz in û ji bo civakê dibin mînak." **NÛJİNHA**





# 'Saleke dagirtî bi berhemên hunerî ji çanda hemdem û kevnar'

Rêvebera Hunergeha Welat, Rozalîn Dêrik da zanîn ku sala 2024'an dagirtî ye ji berhem û stranên ji çanda hemdem û kevnar. Di heman demê de diyar kir ku wê stranek ji bo hilbijartinên şaredariyan û yên Partiya Siberojê, stranek girêdayî zimanê kurdî û mozîkjenên kurd di dema pêş de derkevin.

**Hemza Sêvo/Qamişlo**

Hunergeha Welat yek ji saziyên hunerî ye ku li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xeba hunerî dike. Têkildarî kar û xebata ku hunergeh dide meşandina jî rêvebera wê Rozalîn Dêrik bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû

**Ji destpêka sala 2024'an ve, Hunergeha Welat, çi kar û xebata hunerî daye meşandin?**

Yekem xebata hunerî ya îsal ku Hunergeha Welat çêkir, Sitranên Keziya Sor bû, ev stran weke fîlmê mozîkal tê hesbandin. Ji ber ku ev berhem bûyerên ji destpêka avakirina gerdûnê heta roja îro vedibêje. Bi taybet dîroka jinê desthilatdariya li ser têkirin, jin tê de di 7 qonaxan re derbas dibe, ji wê serdema kevnar, jin di pêşveçûna dîrokê de û heya serdema ku Rêber Apo gotina Jin, Jiyan, Azadî, dibêje, di vê berhemê de tê xuyakirin. Ev berhem ji nîvê sala 2023'an ve li ser dihat xebitandin. Ji ber ku berhemeke hunerî ya mezin bû û êrişên dewleta Tirk a dagirker ku bû astengiyek jê re, 7 mehan domand û di Adarê de hat belavkirin. Berhema ku bi şûn de jî hat derxistin, Kilîpa Êmo bû. Kilîba Êmo, berhemeke folklorî ji folklora herêma Mêrdînê ye. Ev stran li ser jina bi navê Êmo ye, Êmo jî jineke jîr e çavdêriya malê dike, bi tena xwe li gund maye, hemû kar û barên gund dikeve ser milê wê. Ango bi kurtasî naveroka wê li ser berxwedana jinekê ye dixwaze bijî û gundê xwe jî vejîne. Dîmenê



kilîpa Êmo li gundê Girdêwan yê girêdayî bajarê Qamişlo ye, hate kişandin û 10 rojan dem bir heta ku hat amadekirin. Berhema din kilîpa zarokan ya bi navê Ez Herin Gund, bû. Naveroka vê klîpê li ser şêweyê jiyana gundan a bi rengê jiyana komînal û şêweyê jiyana bajaran e. Em dizanin jiyana gundan û rengê civaka komînal her ku diçe ber bi bajarvaniyê ve diçe, lê bi riya vê berhemê me xwest ku şêweyê jiyana gundan bi rengekî xweşik û bedew ji zarok û hemû kesî re bidin destnîşankirin. Ev klîp jî li gundê Girdêwan, hate kişandin û heftiyekê dem bir heta ku hat amadekirin. Piştî lidarxistina Festîvala Orkêş ya sala bûrî, erkek kete ser milê Hunergeha Welat ku pêwîste hemû stranên komên hunerî yên di fastîvalê de hatin gotin, bi riya hunergehê re werin derxistin. Ev kar jî bi dawî bû û bo stranên komên hunerî tev hatin bidawîkirin û me radestî wan kirin.

**Niha çi amadekarî ji bo derxistina stran û berhemên hunerî çêdibin, herwiha wê çi berhem di dema pêş de werin çêkirin?**

Xebata ku niha em dikin û hîn jî berdewam e; xebat çêkirina klîpên folklorî ye. Em dixazin hunermendên kurd yên bi temen mezin kom bikin û stranên folklorî yan jî yên taybet yên wan tomar bikin. Armanca me ji vê yek zindîkirina folklora kurdî ye, li rexekî din jî, gihandina nameyeke taybet bi riya wê sitrana folklorî. Mînak weke berhema Êmo, me dixwest bi şêweyê folklorî nameyekê bo civakê bighînin ku çiqasî jina kurd li ber xwe dide. Lema jî ev pirojeya ku me dest pê kiriye di vê çarçoveyê de be. Li aliyekî din hunergeha çavdêra çanda civakê ya kevnar û hemdem e, li ser vê rêçê jî berheman diafrîne. Hunergeha Welat buyerên ku diqewmin di nav civakê de, ji wan jî berheman bi rengekî bedew û hunerî çêdike. Di vê çarçoveyê de jî em stranekê li ser hilbijartinê Partiya Sûriya Siberojê û straneke din jî şaredariyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê çêdikin. Ev herdu stran jî di nava destê me de ne û di demeke nêz de wê werin belavkirin. Wekî din jî stranên tevahiya komên hunerî yên hemû pêkhateyan yên ku bixwazîbin derxînin û ew stran xwedî ast be, bi riya hunergehê tên derxistin. Ji bo dema pêş jî berhemek bi taybet ji bo amûrjenên kurd in, her amûrjenekî ku di warê jenandina amûrên muzîkê de pispor be wê cihê xwe di vê klîpê de bigire. Ev berhem wê tenê muzîk tê de hebe û wê muzîkjen wê muzîka xwe hilbijêre. Bi rastî hin amûrên muzîkê yên kurdî hene bikaranîna wan pir kêm bûye, lewma jî armanca me ji ew e vê berhemê ku wan amûrên kevnar yên kurd vejînin. Li aliyekî din jî wê berhemek di derbarê zimanê kurdî de jî were amadekirin. Berhemeke din jî bi navê Karê Malê wê were çêkirin,



ev berhem ji stranên komên hunerî yên TEV_ÇAND'ê ne û wê berhem li hunergehê bi xwe, ango ne li cihekî ji derve wê were çêkirin be. Di heman demê de jî berhemek din jî bi taybet ji bo zarokan bi navê Karê Zarokan wê di dema pêş de were çêkirin. Îsal saleke dagirtî ye ji berhemên cuda yên çandî, hunerî û hwd… Lewma jî wê her mehek-du meh berhemek wê were belavkirin.

**Berhemên ku Hunergeha Welat di dema bûrî de afrandine, dengvedanek di nav civakê de dane çêkirin, gelo çi astengî derdikevin pêşiya vê xebatê?**

Bi rastî astengiyên ku derdikevin pêşiya kar û xebata me ya hunerî de di asta yekê de siyaseta PDK'ê ye. Wekû em dizanin xebata em dikin; xebateke hunerî ye û ti girêdana wê bi mijarên siyasî re tune ye, lê belê dîsa jî bi hemû şêweyan rê li pêşiya karê me yê hunerî digire. Di sala borî de daxaz hat kirin ji bo ku Hunergeha Welat tevlî festîvaleke hunerî ya Silêmaniyê bibe. Me jî amadekariyên xwe ji bo tevlîbûna fastîvalê, kirin. Lê destûr neda ku em derbasî Başûrê Kurdistanê bibin û tevlî wê festîvalê bibin. Ne tenê wiha jî, lê belê pirî caran amûrên teknîkê yên cuda ji bo Hunergeha Welat pêwîst dike, ev amûr jî ji derveyî herêma me, bi riya Başûrê Kurdistanê ji me re tên. Lê heta ku derbasî herêma me dibin gelek astengî ji aliyê PDK'ê ve ji bo derbasbûna wan tên çêkirin û carnan jî naghêjin nav destên me. Dîsa di sala 2023'an de Hunergeha Welat ji aliyê welatê Fransa hate vexwendin ji bo festîvala muzîkê ya li ser asta cîhanî bû. Lê mixabin careke din PDK'ê nehiştin em derbasî Başûr bibin û biçin Fransa. Bi rastî ger ev beşdarbûn pêk bihata û em tevlî festîvaleke wisa bûbuna wê gelekî çanda kurdî li Ewrupayê berbelav bûya, di heman demê de wê sûdeke mezin bidaba çanda kurdî. Ji xwe armanca me jî wisa bû ku sûdeke mezin li çanda kurdî bikira û asta muzîka kurd li pêş bixista lê ev yek pêk nehat.

# Hunermendê bi bilûra xwe ruh dida awaz û stranan: Qale Mere

**Navenda Nûçeyan**

Bi ser koça dawî ya bilûrvanê Kurd Qale Mere 15 sal derbas bûn. Lê, awaza bilûra wî ku awazên Kurdî yên resen û xwezayî lê dixist, timî zindî ye.
Qadir Ebdulazade bi nasnav Qale Mereyê Bilûrvan, zivistana sala 1925'an li gundê Kulice yê ser bi bajaroka Bokan a Rojhilatê Kurdistanê hatiye dinê. Ji ber ku kesek bêdeng bû, Şêx Mihemedê Şêx Burhanê Mukriyanî navê Qale Mere lê kiriye.
Qale Mere hîn nehatibû dinê, bavê wî jiyana xwe ji dest daye, di temenê 6 saliyê de jî dayîka wî




koça dawî kiriye. Weke bixwe jî di axaftineke xwe de gotiye, hemû temenê wî bi bêkesî, hejarî û bêşansiyê derbas bûye.
Qale Mere bi gelek hunermend û helbestvanên navdar ên Kurd ên wekî Hesen Zîrek, helbestvanê mezin Hêmin Mûkriyanî û Hejar Mukriyanî re hevaltî kiriye.
Piştî hilweşandina Komara Kurdistanê (Mihabad) û darvekirina pêşengên wê, Qale Mere jî qaçax dibe û koçî Başûrê Kurdistanê dike. Demek li mala Ebas Axayê Serkepkan û Ehmed Axayê Koyê dimîne. Piştî çend salan careke din vedigere Rojhilatê Kurdistanê.
Qale Mere ku li Îranê beşdarî gelek festîvalên nav û deng ên mûzîkê bûye, li Başûr û Rojhilatê Kurdistanê jî tevlî gelek festîvalên hunerî bûye û hêjayî xelatê hatiye dîtin.
Qale Mereyê Bilûrvan di sala 1950'an de li navenda radyoyên Sine, Tehran, Mihabad û Ûrmiye, her wiha li radyo û televîzyona Kirmanşan gelek parçeyên mûzîkê bi bilûra xwe tomar kirine.
Qale Mere di zimanê Farisî de bi navê "Gencine Muteherik" ango di bi navê "Xezîneyek gerok" beşdarî festîvalên mûzîkê yên Îranê dibe. Bilûra Qale Mere timî awazên ku pesnên xweşikbûna Kurdistanê û xwezaya wê didin, lê dixe. Bi vê yekê re timî resentiya mûzika Kurdî parastiye.
Bilûrvanê nemir Qale Mere 21'ê Gulana 2009'an di 84 saliya xwe de ji ber nexweşiyeke giran li bajarê Bokanê yê Rojhilatê Kurdistanê koça dawî kir. Bihezaran kes û hezkiriyên Qale Mere ji deverên cuda yên Kurdistanê herikîn bajarê Bokanê û tevlî merasîma spartina axê bûn. Cenazeyê Qale Mere, li ser wesiyeta wî, li Bokanê li rex hunermend Hesen Zîrek hatiye definkirin.

# Mirov û Jîngeh

Rêveberê Komeleya Keziyên Kesik a Jîngehî Zîwer Şêxo diyar kir ku pêwîste bi rihê berpirsiyartiyê mirov nêzî Jîngehê bibe, jiyaneke bi tendiroştî ava bikin û wiha got: "Parastina jîngehê û paqijkirina derdorê pir lawaz maye, ji ber vê yekê pêwîste her mirovek çanda parastina jîngehê û paqijiyê di jiyanan xwe de pêş bixe."

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Jîngeh ji bo hebûna mirovan bingehîn e. Ew jiyanê ava dike, bandorê li tevgera mirovan dike, çavkaniyên ku ji bo jiyanê hewce ne peyda dike. Jîngeh hemû aliyên fizîkî, biyolojîkî û civakî yên derdorê, wek ax, av, hewa, şînatî, lawir û avahiyên ku ji aliyê mirovan ve hatine çêkirin, dihewîne û mirovan diparêze û kilîta başbûn, tendiristî û bextewariya mirovan digire.



### Têgihîştina Têkiliya Mirov û jîngehdorê

Têkiliya di navbera mirov û jîngehê de tevlihev û dînamîk e. Ew bi danûstendina domdar a enerjî, heyber û agahdarî tê diyar kirin. Mirovan her gav li hawîrdora xwe ziyanan dighîne jîngehê û li gorî hewcedariyên xwe guhezandiye. Lê belê, pîvan û tundiya bandora mirovî ya li ser jîngehê di van demên dawî de pir zêde bûye, ku rê li ber pirsgirêkên cihêreng ên hawîrdorê yên wekî qirêjbûn, birrîna daristanan, guherîna avhewa û windakirina cihêrengiya jîngehê vedike.

### Sûdên Jîngehek Tendurist

Jîngehek saxlem ji bo tenduristî û pêşveçûna mirovan pêdivî ye. Ew ji mirovan re xwarin, av, hewaya paqij û çavkaniyên xwezayî yên ku ji bo bijî û pêşkeftinê hewce ne peyda dike. Jîngehek saxlem dikare başbûna mirovên derûnî û hestyarî jî zêde bike, rihetbûnê û nûvekirina giyanî peyda dike. Wekî din, jîngehek saxlem dikare beşdarî mezinbûna aborî û bextewariyê bibe, ji ber ku ew madeyên xav, enerjî û çavkaniyên din ên ku ji bo pîşesazî û karsaziyên cihêreng hewce ne peyda dike. Mirov bi giranî bi çavkaniyên xwezayî yên wekî hewa, av, ax û enerjiyê ve girêdayî ye. Ev çavkanî bêdawî ne û nayên nûkirin, kêmbûna wan dikare encamên cidî li ser xweşiya mirov û jîngehê hebe. Çalakiyên mirovî yên wekî zêde vexwarin, gemarî û hilberîna çopê jî dikarin bibin sedema kêmbûna çavkaniyê û xerabûna jîngehê ku dikare pirsgirêkên jîngehê bêtir girantir bike.

### Têkiliya di navbera avhewa û tenduristiyê de

Guhertina avhewayê yek ji xetereyên herî mezin ên jîngehê ye li ser tenduristî û xweşbûna mirovan. Ew dikare bibe sedema pirsgirêkên tenduristiyê yên cihêreng ên wekî stresa germê, nexweşiyên respirasyonê, nexweşiyên avê û nexweşiyên vektorî. Guhertina avhewa dikare pirsgirêkên tenduristiyê yên heyî jî girantir bike û yên nû bi afirîne, nemaze di nav nifûsa xizan de wek zarok, kal û pîr û civakên kêm dahat.

### Gefên jîngehê li ser tenduristiya mirovan

Qirêjiya jîngehê, bermayiyên bi xeter û kîmyewî yên jehrî hin ji wan xetereyên herî mezin ên jîngehê yên li ser tenduristiya mirovan in. Ragihandina van qirêjan dikare bibe sedema pirsgirêkên tenduristiyê yên wekî penceşêrê, nexweşiyên respirasyonê, nexweşiyên hilberandinê û nexweşiyên neurolojîk. Wekî din, qirêjiya jîngehê dikare bibe sedema hilweşandina ekosîstemê, windabûna cihêrengiya biyolojîk, û guherîna avhewa, ku dikare bandorên neyînî yên din li ser tenduristî û xweşbûna mirovan bike.

### Bandora çalakiyên mirovî li ser jîngehê

Xebatên mirovî yên wekî bajarîbûn, pîşesazîbûn û çandinî bandorek girîng li ser jîngehê dike. Ew dikarin bibin sedema hilweşîna axê, hilweşandina daristanan, erozyona axê, qirêjiya avê û guherîna avhewa. Ev çalakî dikarin ekosîstemên xwezayî jî biguherînin û hevsengiya xwezayê têk bibin û bibe sedema windabûna cihêrengiya biyolojîk û tunebûna cureyan.
Di jiyana mirovan de rola biyolojîkî Pirrengiya biyolojîk ji bo jiyan û xweşiya mirovan girîng e. Ew ji me re xwarin, derman, madeyên xav, û çavkaniyên din ên ku ji bo zindî û pêşketinê hewce ne peyda dike. Cûrwaziya biyolojîkî di birêkûpêkkirina karûbarên ekosîstemê yên wekî duçerxa xurek, rêziknameya avhewa, û paqijkirina avê de jî rolek girîng dilîze. Wekî din, cihêrengiya biyolojîk xwedî nirxên çandî, giyanî û estetîkî ye ku ji bo civakên mirovan girîng in.

### Girîngiya Aborî Ya Jîngehê

Jîngeh xwedî nirxek aborî ya girîng e, ji ber ku ew çavkaniyên xwezayî, enerjî û materyalên din ên ku ji bo pîşesazî û karsaziyên cihêreng hewce ne peyda dike. Lêbelê, pêşveçûna aborî û parastina jîngehê bi gelemperî wekî armancên nakok têne dîtin, û hevsengkirina wan dikare dijwar be. Pêşkeftina domdar armanc dike ku bigihîje bextewariya aborî di heman demê de parastina jîngehê û pêşvebirina xweşiya civakî.

### Nêrînên Etîkî Ji Bo Rêvebiriya Jîngehê

Rêvebiriya jîngehê berpirsiyariyek exlaqî ye ku em hemî parve dikin. Ew tê de naskirina nirxa xwezayê ya cewherî û parastina wê ji bo xatirê wê û ji bo nifşên pêşerojê ye. Rêvebiriya jîngehê di heman demê de pêşvebirina dadmendî û wekheviya civakî jî vedihewîne, ji ber ku pirsgirêkên jîngehê bi gelemperî bandorê li civakên marjînal dikin.

### Pêşeroja Têkiliyên Mirov û Jingeh

Pêşeroja têkiliyên mirov û jîngehê bi şiyana mirov ve girêdayî ye ku nirxê xwezayê were nas kirin, rêz li sînorên wê were girtin û pêwîste mirov bi rengekî domdar û berpirsiyar tevbigere. Gihîştina pêşkeftina domdar nêzîkatiyek tevhev û yekgirtî hewce dike ku pîvanên civakî, aborî û hawîrdorê yên başbûna mirovan li ber çavan bigire. Ji bo wê jî li ser asta herêmî, neteweyî û cîhanî xebat û hevkariyeke kolektîf pêwîst e. Bi xebata bi hev re, mirov bikaribe ji bo xwe û ji bo gerstêrkê pêşerojek paştir bi afirînin.
Derbarê wate û girînigiya jîngihê di civakê de û parastina wê rêveberê Komeleye Keziyên Kesik a Jingihî Zîwer Şêxo ji Rojnrmrya me re axivî. Zîwer Şêxo bal kişand ser hişmendiya talanker ya kaptelîzmê ku ne rastiya civak û mirovan e û wiha got: "Bê guman dema em behsa jîngihê dikin, em behsa hemî hawîrdora xwe dikin wekî ax, av, ba, mirov, lawir û keskahî. Her wiha em nikarin reftarên xwe wek mirov û bandora me li ser hewlîdora me paşguh bikin, ji ber vê jî rolekî mirovan ya pir girîning li bandorkirina li ser jîngihê heye û li ser pêşeroja hemî cureyan heya, mixabin serdema kaptelîzim û pêşesaziya heyî de bandoreke neyinî de li pêşketiye, ev yek jî bûye sedemên kirîzan. Dema em behsa civaka newletîk û kilanên destpêkê bikin û heta têgeha navendiya dewletê, mirov bi hewîrdor û jîngiha xwe re di nava li hevkirinekê de ne û hevsengiyek heye. Her wiha heta niha di nav hin civakan de ku pir bandora bajaran li wan ne hatiye kirin, em van aliyan dibînin û qasî pêwîstiya wan bi xwezayê re sûd hatiya girtin. Ji bo wê jî mirov digihîje ku ev hişmendiya talanker ya ku îro hatiye pêşketin êdî daristan, çiya û deriya dane ber xwe û didin kampaniyên mezin re da ku bibe pere ji wan re. Herwiha ev hişmediya talanker ya kaptelîzmê, ne rastiya civak û mirova ye."

### 'Bingeha civakê jîngihe'

Zîwer di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Di nava civaka kurd de 2 aliyên xwe hene, yek di parastina jîngihê ku parastina xwezayî ji aliyê kal û pîrên me de, heye roja îro parastin ji aliyên wan heye, ya din jî bajarbuyin ku saziyên dewletê dikin. Her wiha civak bi giştî ne tenê gelê kurd, rêvebirina dewletên navnetewî ya navendî de û li vir jî hişmediya serwer ya ku heye, hişmendiya desthiletî ye. her wiha di gotarên dawî de ku piştê piratîkma Rêber Abdullah Ocalan ku yek ji beşên Netewa Demokiratîk, îkolojiya ye. êdî keta di nava gotare kurdî ya siyasî de, di destpêkê de hin mirov ne bi awayekî balkêş lê mêze dikirin, pêwîste her kes bi çavê bav û kalên me li xweze û jîngihê mêze bike û bi wê kurahiyê û hezkirinê. Jîngih têgiheke nûye li ser asta cîhanê û zanistê jî, ji ber ku qirîz li ser hat çêkirin ji aliyên dewlet û siyasetan ve. Lê li Rojavayê Kurdistanê tevgerek baş heye, di salên borî de gelek perwerdeyên di akadimiya civaka demokiratîk de ku li ser asta civaka sivîl, şaredarîyên ku wekî îkolojîk xwe ragihandin heta dayîn û hişmendiyek da avakirin. Lê belê ev tenê ne bese, pêwîste ji hemû aliyan ve bê navber û ferq û cudahî bi tewrî tenê nabe pêwîste parastina jîngihê bi piratîk û tevgereka xurt were pêk anîn, ji ber ku bingiha civakê jîngiha."

### 'Çanda parastina jîgihê û paqijiyê di jiyanan xwe pêşbixe'

Zîwer Şêxo rêveberê Komeleye Keziyên Kesik a Jingihîn di dawiha axaftina xwe de diyar kir ku parastina jîngihê di civakê de pir lawaze û wiha got: "Pêwîste em heftarên xwe biguherin, di heman demê de pêwîste em jiyana xwe li ber çavan derbas bikin, ji ber ku tevgera me ya di jiyanê de hem ji aliyê neyinî û hem jî ji aliyê erênî de, bandorek li jîngiha me tîne. Her wiha pêwîste em bi rihê berpisiyartiyê li gor jîngiha xwe derkevin û jiyaneke bi tendirostî bidin avakirin, ji ber ku civaka me pir lawaze di vê mijarê de ku parastina jîngeh û paqijkirina derdorê re pir lawaz me ye, ji ber vê yekê pêwîste her kes wê çanda parastina jîgihê û paqijiyê di jiyanan xwe pêşbixe."



## Dadgehên tunekirina kurdan

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Dadgeh ji bo sûcdaran, kesên zalim, diz, destdirêj û qatilan darizînin û kesên nebaşî kirine werin cezakirin, tên/hatine damezrandin. Ji bo di nava civak û kesan de, dadweriyekê pêk bînin û baweriya nava civakê xurt bikin, xwedan erk û peywirêne.
Dadgeh û kesên tê de kar û xebatê pêk tînin, pîvanên pêşketina civakê tê de didin xuyakirin.
Dewletên wê sedsalê, behsa dadweriya kesayetî û civakî dikin.
Bêguman Dewlet û civakên ku tên birêvebirin; ji bo wan Dadgeh an dewleta ku li gor zagonan tê birêvebirin aramî û huzura wan baştire, ji dewletên ku bê serpereştiyazagonan tên birêvebirin. Ji bo gelê me dadgeh û qanûn tên wateyeke dîtir!
Dadgehên ku dagirkerên me avakirine û kar û xebatên tên kirin, rastiyekî wan heye: ji bo gelê me derveyî qanûn û nîzamê bidin nîşandan, hatine avakirin û tên avakirinê.
Ji komara Tirk bigre heta Komara Iraqê, ji Îranê bigre heta Sûriyê, dadgehên hene karê wan tenê; malwêranî, sêdarekirin, zindankirin û tunekirin e. Ji bo me Kurdan dadgeh tenê xirabî, nebaşî û zilm e.
Di dîroka me Kurdan de ji ber ku dadgehên hatine avakirinê tenê mirin û zindan nîşanî me dane, gelê me; ji dadgehan dûr direvin. Ji ber vê psîkolojiyê weke Netewe me Kurdan heta roja me ya îrojî, kar û pirsgirêkên xwe yên navxweyî nebirine gel dadgehên wan. Me bi cemaat û rûsipiyên xwe re pirsgirêkên xwe di nava xwe de çareser kirine.
Heta em azad nebin, divê ev şêwaz berdewam be. Dadgehên ku qaşo gere dadweriyê di nava civakê de cîbicî bikin, di 16'ê Gulana 2024'an de li sîyasetmedarên Kurdan cezayê zîndanî barandine.
Bi navê "Şerq Îstîklal mahkemesî" di dema şêx Seîdê kal de, xortekî bi navê dadweriyê ji ber ku zimanê Tirkî nizane, hatiye sêdarekirin. Ev dadgehê dagirkerên Kurdistanê ne û ev jî biryarên wan in.
Welatê me bi navê qanûn û dadweriya navnetewî hatiye perçekirin. Pismam ji bo serdana pismam bike, divê dijiyatiya van qanûnên navnetewî derkeve. Bi navê qanûn û dadgehan zilmekê, zordariyekê dij mirovî liser me hatiye pêk anîn û tê pêkanîn.
Xaka me kirine çar, heta pênc perçe.
Ev zilma han bi qanûn û dadgehên navnetewî li ser me Kurdan hatiye sepandin. Şal û şepik, laçik, fîstan, ziman, çand û hunera Kurdî, dîroka me, navê welatê me Kurdistanê jî, li gor dadgehên wan gunehin. Dadwer û dadgeh ji bo me tune bikin, bihelînin hatine erkdarkirin. Destdirêjiya Keçikên me dikin, talana ser erd û bin erdê me dikin. Ji ber em doza mafê xwe yê xwezayî, olî û mirovî dikin; em tên zîndankirin û kuştin.
Dadgehên dagirkeran ji bo mafê milletê me desteser bikin, kesê doza mafan bikin cezayên giran li wan dibarînin. Wek tê zanîn Doza me bi dadgehên Şerq Îstîklalê, dema Şêx Seîd despêkirin, bi Dadgehên 12 Îlonê kadirên bizava Netewî û serhildana wan berdewam kir, bi Dadgeha Îmraliyê di dîroka sêdarekirina roja 29 Hezîranê cezayê îdamê li Rêberê gelê Kurd hate birîn û di 16 Gulanê de sîyasetmedarê Kurdan bi dehan salan hatin cezakirin.
Divê em Kurd van dadgehan nas nekin! Ev Dadgeh û qanûn ji bo me tunebikin hatine cîbicîhkirin. Gelê me û kadirên bizava Netewî bi deh hezaran neha di zîndanên wanan de ne. Azadiya me di destê me de ye û gellekî nêzîke.



# 'PDK'ê ji dengê rastiyê ditirse'

Rojnamevanên Ajansa Mezopotamiyayê diyar kirin ku PDK'ê bûye partiyeke ku li herêmê xizmeta berjewndiyên dewleta Tirk û dijminatiya gelê Kurd dike. Herwiha dan zanîn ji ber PDK'ê ji dengê rastiyê ditrse rojamevanên dengê rastiyê deke armanc.

**Argêş Gewda/Qamişlo**

Rojnameger û edîtorê beşa erebî yê Rojnewsê Silêman Ehmed di 1'ê cotmehê de ji bo serdanê ji Başûrê Kurdistanê berê xwe da Rojava û çû cem malbata xwe ya li Taxa Şêx Meqsud a Helebê. Ehmed, di 25'ê cotmehê de xwest bi ser deriyê Pêş Xabûr (Sêmalka) re derbasî Başûrê Kurdistanê bibe. Lê hêzên PDK'ê ew revand û heta niha ti agahî jê nayê girtin. Hefteyek piştî windabûna Ehmed, asayîşa PDK'ê ya Dihokê daxuyaniyek da û îdia kir ku "Silêman Ehmed rojnameger nîne." Bi vê daxuyaniyê li xwe mikûr hat ku Ehmed ji hêla wan ve hatiye revandin.
Derbarê mijarê rojnamevanên ajansa Mezopotamiyayê Delal Akyüz û Firat Can Arslan rojnameye mera axivîn.

### 'Ev revandin bi destê MÎT û Parastinê hatiye kirin'

Firat Can Arslan diyar kir ku yek ji çekên herî mezin ên faşîzmê siyaseta manîpulasyonê ye û wiha got: "Rejîmên otorîter ji bo ku desthilatiya xwe di nav civakê de xurt bikin serî li manîpulasyonê didin. Amûra herî bingehîn a vê hewldanê propaganda û çapemenî ye. Hikûmetên ku torên xwe yên medyayê ava dikin, ji ber vê yekê li dijî kesên ku rojnamegeriya rast dikin û pirsgirêkên civakê vedibêjin şer îlan dikin. Ew li dijî rastiyê, ku tirsa



Firat Can Arslan

wî ya herî mezin e, şer îlan dike. Li Tirkiyeyê her roj êrîşên li dijî Çapemeniya Azad dewam dikin. Her roj hevalên me tên binçavkirin û girtin. Sedema bingehîn jî nûçeyên wan ên li ser çareseriya pirsgirêka Kurd a ku pirsgirêka herî kûr a Komarê ye û ev 100 sal in dewam dike û polîtîkayên tecrîdê yên li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan e."
Arslan da xuyakirin ku PDK`ya ku bûye kirasê desthilatdariya AKP-MHP'ê, ji feraseta demokrat a li ser navê xwe dûr e û wiha berdewam kir: "PDK'ê bûye partiyeke ku li herêmê xizmeta feraseta neo-osmanîst a Tirkiyeyê dike û ji bo vê jî dijminatiya gelê xwe, gelê Kurd dike. Li hemberî têkoşîna azadiya Kurd, veguheriye şanderê projeyên mezinkirina faşîst a Tirkiyê ye. PDK'ê rêbazek rêveberiyê pejirand ku zagona dijminatiyê li gelê xwe yê ku mîna wê nafikire, dike.



Delal Akyuz

Li gorî qanûnê ti erkên xwe bi cih nayîne. Hevalê me yê rojnameger Silêman Ehmet ji 25'ê Cotmeha 2023'an di destê PDK'ê de dîl tê girtin. Dadgehek jî nebû, wek dîle ke şer nêzîkatî lê tê kirin. Em jî nizanin ew di çi rewşê de ye. Ev rewş li dijî mafên mirovan û wijdanê ye. Kuştin û girtina rojnamegerên Kurd ji ber pêkanînên PDK'ê normal bûye. Li Başûrê Kurdistanê jî mîna li Tirkiyeyê bêhejmar êrîş li dijî rojnamegeran tên kirin. Ji bo berjewendiyên mezin ên Tirkiyeyê, û ji bo berjewendiyên xwe yên biçûk, hem civakê û hem jî rojnamevanan bêdeng dike."
Ji destdana Silêman Ehmed wê ji bo PDK û Mesrûr Barzanî bibe lekeyek reş yê dîrokê. Weke hevalên me yên ji aliyê PDK'ê ve hatin qetilkirin, Serdeşt, Osman, Vedat Hisên a.
Arslandi dewama axaftina xwe de wiha anî ziman: "Sedema van polîtîkayên PDK'ê bêdengkirina dengê her kesê ku li dijî daxwazên wan ên qirêj radiweste û rastiyê diqîre ye. PDK ji çapemeniya azad ditirse. Mîna hikûmeta AKP û MHP'ê ye. Li gorî daneyên Navenda Parastina Mafên Rojnamegeran a Metro Center (MCJR) li Herêma Federal a Kurdistanê di sala 2023'an de 249 binpêkirin li dijî rojnamegeran pêk hatiye. Tenê di sala 2023'an de 37 rojnameger hatin binçavkirin. Ev êrîşên li ser rojnamegeran ne tenê pirsgirêka rojnamegeran e, pirsgirêka hemû civakê ye. Bingeha astengkirina mafê gel a wergirtina agahiyan di plana rizîna civakî û gendeliyê de ye. Ji bo vê jî li dijî her êrîşa li dijî rojnameger û Çapemeniya Azad bi taybetî di kesayetê Silêman Ehmed de têkoşîneke berxwedanê ya civakî pêwîst e. Bi vê boneyê em bang li partiyên siyasî, rêxistinên sivîl û rêxistinên mafên mirovan dikin ku hevgirtinê nîşan bidin û erka xwe pêk bînin. Silêman Ehmed rojnamevan e û divê destûr bê dayîn ku bi parêzer û malbata xwe re hevdîtinê pêkbîne û di zûtirîn dem de were berdan."

### 'Zexta KDP ser Silêman Ehmed dimeşîne, Bakurê Kurdistanê AKP didomîne'

Di heman çarçoveyê de Delal Akyüz da zanîn ku salên dawî de herî zêde armancên zextên li ser çapemeniyê, li ser xebatkarên çapemeniya azad in û wiha got: "Em li Tirkiyeyê di bin zext, binçavkirin û gefa girtinê de pîşeya xwe didomînin. Lê di nûçeyên ku ji herêma Basûre ya Kurdistanê tên, ev zêdetirî 8 mehin çarenivîsa Silêman Ehmed nayê zanîn. Lê mixabin derheqê vê mijarê de di alîyê PDK`ê ve ti daxuyanîyên fermî ne hatîye dayin. Xebatkarên çapemeniya azad her tim tînên ser ziman ku hêzên desthiladar zext dikin dibêjin gor me bi meşin em vê tiştê pêk nayînin. Xebatkarê çapemeniya azad jî lêgerîna heqîqetê ne. Erê, dibe ku serdestan ji tiştên ku hatine nivîsandin hez nekin. Lê ev nayê wê wateyê ku mirov tenê ji ber nûçe dinivîse bi mehan mirovan îzole bike."
Delal Akyuz wiha axaftina xwe qedand: "Em ji roja destpêkê ve pêvajoya derbarê Silêman Ehmed de dişopînin. Tevî ku di vê mijarê de gelek çalakî, bûyer, daxuyanî û bang hatin kirin jî, rêveberiya PDK'ê ti daxuyanî neda. Ev rewş binpêkirinên giran ên mafên mirovan bi xwe re tîne. Weke xebatkarên çapemeniyê ku di bin şert û mercên dijwar de pîşeya xwe didomînin, em rast nabînin ku xebatkarekî çapemeniyê bi vî rengî tecrîd bikin. Divê PDK di demildest dev ji vê helwesta xwe berde. Em bang dikin ku tecrîda li ser Ehmed rake hevpîşeyê me dîsa wek berê pey lêgerîna azadîyê bigere û bizivire ser erka xwe li gel malbat û xizmên xwe."

# Êrîşên Dagirkeriya Tirkiyê li ser herêma Efrînê û Şehbayê yên meha Gulanê

**Zana Roj/ Şehba**

**Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê êrişên xwe yên li dijî gelê Efrînê bê navber dewam dike, koçberên Efrînê yên li herêma Şehbayê rojane têne hedefgirtin. Di meha Gulanê de herêma Şehbayê bi çek û balafirên bê mirov hate topbarankirin û di encama wê de gelek welatî şehîd û birîndar bûn.**

Siyaseta faşîzma Tirkiyê ya tunekirina gelê Kurd bi hovîtiyeke gelek mezin tê domandin. Bi taybet êrîşên hovane li Hermên Parastinê yên Medyayê, Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê navber pêk tîne. Her çiqas armanca dagirkeriya Tirkiyê talankirin, tunekirin û dagirkirin be jî lê bi pêkanîna van êrîşan faşîzma Tirkiyê ne li hember Gerîlayên azadiyê di Herêmên Parastinê yên Medyayê de û ne jî di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de gihşt tu encaman. Li hember van êrîşan têkoşîneke bê hempa tê meşandin û di hemû aliyan de bersivên giran tên dayîn.
Herêma Şehbayê ya ku bi koçberên Efrînê tê naskirin. Di qonaxa duyemîn ji berxwedana Serdemê, gelê Efrînê bi hêza xwe ya berxwedan û têkoşînê ji 6 salan ve li hember hemû pilan û siyasetên dijmin li ber xwe dide. Dagirkeriya Tirk piştî dagirkirina herêma Efrînê ji 6 salan ve gelê koçber û şêniyên Şehbayê dike hedef. Bi tavahî teknîka xwe ya pêşketî û balafiran herêmê topbaran dike. Di encama van êrêşan de bi dehan komkûjî li dijî zarok û xelkên herêmê pêk anî.
Rûxmî ku hemû êrîşên dagirkeriyê li hember cavê cîhanê tên pêk anîn, her wiha tavahî êrîş û encamên êrîşan tên belgekirin û belavkirin. Lê raya giştî li hember van sûcan bê deng dimîne û dewleta Tirk ya dagirker weke dagirkerî û sûcdar nagirin dest. Ev yek rê li pêşiya dagirleriya Tikr vedike ku vê yekê berdewam bike.
Ji destpêka meha Gulanê ve artêşa Tirk û komên çeteyan bi giranî gundewarên Efrînê û herêma Şehbayê topbaran dike. Di van topbaran de zarok hatin şehîd xistin û birîndar çêbûn, her wiha zeviyên welatiyan hatin şewitandin.
Li gorî belgekirina Ragihandina Leşkerî bîlancoya êrîşên dagirkeriyê di meha Gulanê de li ser tavahî herêmê wiha bû.
dagirkeriya tirkiyê û komên çeteyan bi giştî 30 gundên herêmê kirin armanc.
Bîlancoya giştî ya topan wiha bû:
Dagirkeriya Tirk û çeteyên wê bi hezar û 193 guleyên obîsan, 153 guleyên hawn, 20 guleyên tangan, 130 guleyên çekên qedexekirî, 30 guleyên topên Girad , 30 guleyên topên SPG, 5 guleyên Isbecîno û 6 caran bi balafirên bêmirov herêm kir armanc.
-Di 1'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker 2 caran bi balafirên keşfê gundê Şawargahê hedef girt û di encamê de tenê ziyanên madî çêbûn.
-Di 5'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker maleke sivîlan a li gundê Tanabê hedef girt û di encamê de tenê ziyanên madî hebûn.
-Di 12'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker gundê Maranazê bi balafirên keşfê hedef girt û ziyan



tenê madî bû.
-Di 14'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker gundê Muşeirfa hedef girt û di encamê de zerar li zeviyên cotyaran ên gundê Taana şewitîn û di encamê de 5 hektar genimê welatiyê bi navê Ebdulhadî El-Tayeb yê ji gundê Taana.
-Di 15'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker bi balafirên bê mirov noqteyeke hêzên hikûmeta Şamê hedef girt û ziyan tenê madî bû.
-Di 16'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker gundê Maranazê bi balafirên keşfê hedef girt û ziyan tenê madî bû.
-Di 18'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker gundê Semûqayê hedef girt û di encamê de 3 zarok birîndar bûn û zarokekî din jî yê bi navê (Ferês Xelef Îbrahîm 13 salî) jiyana xwe ji dest da.
-Di 19'ê Gulanê de artêşa Tirk a dagirker Bendava Şehba kir hedef û di encamê de leşkerekî girêdayî artêşa Şamê yê bi navê Beşar Cebûra (36) birîndar bû.

# ‘Di serlêdanên partiyan de mijara sereke azadiya Rêber Apo ye’

Berdevkê Insiyatîfa Sûrî ya ji bo Azadiya Rêber Abdullah Ocalan, Ferzende Munzir diyar kir ku heya niha serdana bêtirî 20 partiyan hatiye kirin. Ferzende da zanîn ku armanca insiyatîfê rolpêdana partiyan di Pêngava Azadiya Rêber Apo de ye û wiha got: “Partî giranîbûnê didin azadiya Rêber Apo û serdanên ku tên kirin. ”

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Di hemwextdarî pêngava Azadiya Rêber Apo ya qonaxa duyem de, Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Apo li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi xebateke ji bo azadiya Rêber Apo ya fîzîkî kir.
Serdana tevahiya partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Sûriyê armanca Insiyatîfa Sûrî ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan e, çi partiyên kurdî bin yan erebî yan xiristiyanî bin.
Hêjayî gotinê ye ku pêngava serdana partiyan tê domandin û heya niha Insiyatîfa Sûrî serdana zêdeyî 20 partiyên siyasî kiriye.
Her wiha têkildarî serdanên Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Apo ji partiyên siyasî re û kar û xebata dema pêş ji bo azadiya Rêber Apo, berdevkê insiyatîfê, Ferzende Munzir ji Rojnameya me re axivî.

**‘Mebest me tevlîkirina partiyan di Pêngava Azadiya Rêbertî de ye’**



Ferzende Munzir diyar kir ku armanca me bilindkirina asta beşdarbûna partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê di Pêngava Azadiya Rêber Apo de ye û wiha got: “ Wekî em dizanin îro pêngaveke mezin li ser asta cîhanê ji bo azadiya Rêber Apo bi durşmeya “Ji Rêber Apo re azadî ji pirsgirêka kurd re çareserî”di qonaxa duyem de bi rê ve diçe. Bi pêşveçûna vê pêngavê re jî me xwest xebatek bi vî rengî bikin. Me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest bi pêngavekê kiriye ku serdana partiyên herêmê dikin. Ev ne cara yekem e ku serdan bi partiyan re tên çêkirin ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo, lê belê cara 3’an e. Heya niha me serdana zêdetirî partiyan kirine, di nav van partiyan de hin partî hene ku li ser asta Sûriyê bi giştî ne. Armanc ji van serdanan jî ew e ku partiyên siyasî jî tevlî pêngava azadiya Rêber Apo bibin. Her wiha em nas bikin ku çi planên wan di warê têkoşîna ji bo bidawîkirina tecrîda li ser Rêber Apo de hene.

**‘Pêşniyara partiyan; xurtkirina têkiliyan bi dewletên erebî re têkildarî azadiya Rêber Apo’**

Munzir da zanîn ku partiyên siyasî yên ku em serdana wan dikin, diyalogê û pêşnyanran dikin ji bo azadiya Rêber Apo û wiha domand: “Di van serdanên ku em bi partiyên siyasî re çêdikin de, girêdayî felsefe, nêrîn û ramanên Rêber Apo ne. Her wiha di derbarê rola Rêbertî ji bo azadiya gelan û şêweyê sîstema netewa demokratîk de ye. Di heman demê de jî mijara binpêkirinên ku di derheqê Rêber Apo de li Îmraliyê tê kirin û şert, merc û cezayên ku li ser Rêbertî têne ferzkirin tê nîqaşkirin. Di asta sereke de jî bidawîkirina tecrîdê û azadiya Rêber Abdullah Ocalan a fîzîkî tê nîqaşkirin. Li aliyekî din jî partiyên siyasî, nêrîn û pêşinyarên xwe jî di derbarê azadiya Rêber Apo de dan. Ji van nêrîn û pêşnyaran rêkirina nameyan girêdayî mijara azadiya Rêbertî ji meclisên ereban weke Komkara Erebî. Hem jî partiyan tekez kir ku pêwîste azadiya Rêber Apo li ser asta Rojhilata Navîn were nîqaşkirin. Em dibînin ku partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê giraniyeke pir mezin didin azadiya Rêber Apo û serdanên ku girêdayî vê yekê pêktên. ”

**‘Wê pêngaveke cîhanî taybet ji bo parêzeran were destpêkirin’**

Berdevkê Insiyatîfa Sûrî ya ji bo azadiya Rêber Abdullah Ocalan, Ferzende Munzir dest nîşan kir ku wê parêzerên cîhanê dest bi pêngaveke cîhanî di dema pêş de bikin û hin planên din jî di asta Rojhilata Navîna de wê werin kirin û wiha axivî: “Xebata ku wê di dema pêş de were kirin; komkirina partiyên siyasî yên ku me serdana wan kiriye û diyarkirina encama serdanan bi riya daxuyaniyekê. Wê kar û xebata ku hatiye kirin û encamên serdanan bi daxuyaniyekê ji raya giştî re were eşkerekirin. Her wiha em ê nameyan têkldarî tecrîda li ser Rêber Apo ji meclis û parlemanên gitşî yên Rojhilata Navîn re bişînin. Di heman demê de jî em hewldaneke mezin bikin ku çalakiyên mezin û konfransan jî li dewletên Rojhilata Navîn li dar bixin. Li aliyekî din jî ger derfet çêbibe wê encamên pêngava îmzeyan jî bi şande û aliyê diplomasî ji Meclisa Yekîtiya Ewropa û hemû rêxistinên cîhanî. Her wiha wê pêngaveke cîhanî bi taybet ji bo parêzeran were destpêkirin. Wê parêzerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, û tevahiya parêzerên cîhanê îmzeyan ji bo azadiya Rêber Apo bidin û kom bikin ji dadweriya Tirkiyê re bişînin. ”

# Sebahat Tuncel; Li hemberî faşîzmê em serî natewînin

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

**Parlementera HDP`ê ya kevin û girtiya doza Kobanê Sebahat Tuncel diyar kir ku doza Kobanê dewama tecrîd û siyasetên qirkirinê ye. Herwiha Sebahat destnêşankir ku ew ê tu caran li hemberî faşîzmê serî netewînin.**

Parlementera HDP`ê ya kevin û girtiya doza Kobanê Sebahat Tuncel derheqê berxwedanîya girtîgehê û doza Kobanê bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Hûn dikarin derheqê Doza Kobanê û Berxwedanîya Zîndanan agahî bidin?**

Sala 2014’an ji bona gelê Kurd saleke ku berxwedan gihişte lûtkeya herî bilind. Di vê salê de berxwedaniyeke bê hempa hat meşandin. Yanî em dikarin bêjin her çar parçê Kurdistanê pir deskeftî hatin destxistin. Hilbijartinên meha Pûşberê rêjeya dengê HDP`ê ji sedî 15 bû. Nezî sed kursiyê parlemantoya Tirkiyê dest xistin. Li aliyekî din jî, Rojavayê Kurdistanê berxwedana gelan destpêkir û êrîşên çeteyên DAIŞ`ê ser Kobanê çêbû. Ser van esasan Kurd li her çar parçan bûn yek û bi şêwazên cuda serhildan hatin meşandin. Rejîma AKP`ê û MHP`ê ev berxwedanî ranekir û dest bi êrişên qirkirina siyasî yên hem wext di sala 2016’an de kir. Gelek hevalên me yê sîyasetmedar bi hinceta `endamtiya rêxistinê û parçekirina dewletê` dihatin darizandin. Li gorî agahiyên bê bingeh ez û hevalên min dihatin tewanbarkirin. Doza Kobanê dozek siyasî bû û ti bingeha wê ya hiquqî tine bû. Em bi salan bi hincetên vala hatin mexdurkirin û mafê me yê jiyanî hat astengkirin. Girtîgehên dewleta Tirk ya dagirker ne cihê jiyanê ne û şaneyên mirinê ne. Gelek dîlgirtiyên sîyasî di aliyê tenduristî de giranin û pêwîste demildest bên berdan. Berovajî wê bi hincetên cuda tên tewanbarkirin û salan cezan li wan tên birîn. Li hemberî vê ew ti caran serê xwe natewînin û bi çalakîyên cûda berxwe didin. Dewleta tirk jî ser girtîgehan zexta zide dike û mafên wan yên xwezayî û mirovî asteng dikin.

**Hûn tecrîda Îmraliyê ku li ser Rêber Apo tê meşandin çawa dinirxînin?**

weke tê zanîn ji sala 2011’an ve tecrîdeke girankirî li ser Rêberê gelê Kurd Rêber Abdullah Ocalan tê meşandin. Mafê Rêber Apo yê telefonê û hevdîtinên parêzeran bi hincetên cûda tên qedexekirin. Mirovahî hemû dizane yê alozîya Rojhilata Navîn bide sekinandin Fikir û felsefeya Rêberê netewî Abdullah Ocalan `e. Hêzên dagirker ji ber vê rastiyê agahdarin tecrîda ser Rêberê gelê Kurd tê giran kirin. Ev tecrîde ne tenê li ser kesayeta Rêber Apo ye, lê li ser gelê Kurd giştî tê meşandin. Pêwîste hemû welatparêzên kurd li hemberî vê zilme bê deng nemînin. Yanî tê zanîn ku doza Kobanê li dijî mafên Kurdan hatibû vekirin. Bi destê desthilatîya AKP`ê û MHP`ê dihat rêvebirin. Gelek sîyasetmedar bi şêwazên bêhiqûqî hatin cezakirin. Ev mirov dest ji doza xwe bernadin. Ne 42 salan, hezar sala jî me ceza bikin em ji doza xwe venagerin. Nikarin gelê Kurd bi girtinê, kuştinê xelas bikin.

**Bangawaziya we çi ye?**

Bila ti caran neyê jibîrkirin ku em gelê herî kevnar ku li ser vê axê jiyan dikin. Mafên me di herê aliy de hatiye astengkirin û qedexekirin. Li ser vê bingehê li ji derveyî berxwedan û tekoşîne rêyek me cuda nîne. Em ji girtîgehê hatin berdan raste, lê dilime hîn li gel hevalên me yê ku berxwedanê dikin e. Em ê ser vê bingehê tecrîda Imraliyê bişkînin. Heta azadiya Rêber Apo ya fizîkî, wê têkoşîna me bidome. Em silavên xwe ji Rêberê gelê Kurd Rêber Apo û dilgirtiyên zîndana re dişînin.

**Sebahat Tuncel kî ye?**



Di sala 1975 Bakûrê Kurdistanê li Meletî yê dayîk bum. Sala 1998 di HADEP`ê dest bi sîyasetê kir. Zanîngeha Mersînê beşa kadastro min qedandîye. Min gelek beşên cuda ya tevgera jin da xebat meşandîye. Hevserokê DBP(Partîya Heremên Demokratîk) bum. Parlementera serdema 23`emîn ya bajarê Stenbolê ya HDP`ê hatim hilbijartin. Vek hun jî dizanin sala 2016 bi gelek sîyasetmedarên Bakurê Kurdistanê hatin girtin û bi navê doza Kobanê hat darizandin. Ez jî yêk van bum. 8 sala girtîgeha Sîncanê girtî mam. Sala 2024 jî ez û çend hevalên xwe hatin berdan.



# ‘Bikaranîna çekên kîmyawî binpêkirina peymanên navdewletî ye’

Parêzer Sîpan Xelef da zanîn ku gelê kurd bi rêya qirkirin û asîmîlekirina çandî rastî polîtîkayeke sîstematîk tê, çekên kîmyewî jî amûreke din a polîtîkaya tunekirina sîstematîke li hemberî Kurdan ji aliyê dewleta Tirk ve bê navber tê meşandin.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Bi karanîna çekên kîmyewî di gelek hevpeyman û itifaqên navdewletî de mîna sûcê dij mirovî tê hesibandin. Lê dewleta dagirker a Tirk êrîşên xwe rojane didomîne li dijî gelê kurd, nemaze li ser Herêmên Parastina Medyayê. Her wiha li Başûrê Kurdistanê çekên qedexe yên kîmyawî di nava bêdengiya raya giştî ya cîhanê û li ber çavê wan tê meşandin û li dijî gelê kurd bi sedê caran ev yek hatiye meşandin. Li hemberî vê yekê jî tu dewlet, sazî û rêxistinên navdewletî helwest negirtin û dengê xwe nekirin. Derbarê vê mijarê de parêzer Sîpan Xelef ji rojnameya me re axivî.

**‘Çekên kîmyawî amûreke ji bo qirkirina gelê kurd e’**

Parêzer Sîpan Xelef diyar kir ku gelê kurd di nava gelên Rojhilata Navîn de yên herî zêde ji çekên kîmyawî bandor bûye û wiha domand:” Ji ber ku mayîndebûna gelê kurd dîroka derew a netew-dewletên herêmê radixe ber çavan û projeyên wan ên îdeolojîk asteng dike, ji ber vê yekê zêdetirî sed sal in li welatê xwe yê dîrokî bi rêya qirkirin, asîmîlekirina çandî û bi darê zorê ji cih û warên xwe ve rastî polîtîkayeke sîstematîk a qirkirinê tê, çekên kîmyawî amûreke din a polîtîkaya tunekirina sîstematîk li hemberî Kurdan e ji aliyê dewleta Tirk ve bê navber tê meşandin.” Sîpan Xelef destnîşan kir ku di van sed salên dawî de ji bo qirkirina serhildanên kurdan û bi mebesta tunekirina kurdan, gelê kurd rastî êrîşên bi çekên kîmyawî hatin, di encamê de bi hezaran kes jiyana xwe ji dest dan û bi hezaran kesên din jî bi giranî birîndar bûn, ji bilî ziyanên van çekan gihaştin zevî û jîngeha xwezayî, bi sed hezaran kes jî neçar man ji cih û warê xwe koçber bibin.

**Êrîşên dewleta Tirk li ser Qadên Parastinê yên Medyayê**

Sîpan Xelef diyar kir ku artêşa dewleta Tirk a dagirker di sala 2021’an de zêdetirî 367 caran gazên kîmyawî, topên uranyumê û bombeyên fosforê li herêmên Garê/Siyanê, Zandûra/Metîna, Mam Reşo/Avaşîn, Girê Sur, Aris Faris, û Girê Kartal bikar anî û di encamê de nêzî 47 Gerîlayên Azadiyê şehîd bûn.
Sîpan Xelef tekez kir ku ji ber bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe bi awayekî organîzetir çekên kîmyawî bi kar anî û heta niha jî didomîne û got: “Ji 14’ê Nîsana 2022’an heta 14’ê Cotmeha 2022’an nêzî 27 Gerîlayên Azadiyê şehîd bûn.” Li cihên din jî di heman demê de li Şikefta Brîndara ya Zapê 17, li Qada Karkar 5 Gerîla, li Warxlî Avaşîn jî 3 Gerîla şehîd bûn.

**‘Komkujiyên li dijî kurdan’**

Sîpan Xelef komkujiyên li dijî gelê kurd hatin pêkanîn anî ser ziman: Komkujiya Akirê û Keliyê Zîlan.
Di Komkujiya Dêrsimê de bikaranîna gaza kîmyawî bi belgeyên ku herî dawî hatin eşkerekirin û li gorî belgeyên ku Mustafa Kemal Ataturk bi hevoka “veşartî” îmze kiribû û piştre ji aliyê rojnameya Dêrsimê ve hat weşandin, hat îspatkirin.
Piştî sala 1986’an artêşa Tirk bi rêbazên ku di talîmatan de hatine diyarkirin bû sedem ku bi sedan şervanên Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê (ARGK) di şikeft û tunêlan de şehîd bikevin.
Sîpan Xelef bal kişand li ser êrîşa dagirkeriya Tirk li ser Serê Kaniyê, Girê Spî û Til Temir û wiha got: “Di 9’ê Cotmeha 2019’an de gelek sazî û rayedaran bikaranîna fosfora spî ji aliyê dewleta Tirk ve belge kirin, her wiha balafirên Tirkiyê di sala 2018`an de li Efrînê gaza kîmyawî li dijî sivîlan bikar anî, dewletên garnator bêdeng man li hember van êrîşan ji ber vê yekê dewleta Tirk a dagirker êrîşên xwe li dijî gelê kurd domandin.”

**‘Êrîşên kîmyawî binpêkirineke eşkere ya yasaya mirovî ye’**

Sîpan Xelef tekez kir ku êrîşên kîmyawî binpêkirineke eşkere ya yasaya mirovî ya navdewletî û Peymana Çekên Kîmyawî ye û wiha da zanîn:” Tirkiyeyê ev peyman pesend kiriye, nemaze ji ber ku ew aliyek e ji Protokola Cenêvê ya sala 1925`an, ku çekên wiha qedexe dike, ji ber vê yekê, bikaranîna çekên kîmyawî li gorî qanûnên adetî yên navneteweyî qedexe ye.”

**‘Divê berpirsiyarên van kiryarên hovane bên pirsîn’**

Sîpan Xelef di berdewamiya axaftina xwe de got: “Divê civaka navdewletî hewildanên xwe ji bo rêgirtina bikaranîna çekên kîmyawî bike, û berpirsiyarên van kiryarên hovane bipirse, ji ber ku ev yek bi bandor pêk were, divê mekanîzmayên din ên navneteweyî werin damezrandin, ku rastiya karanîna van çekên qedexe ronî bike û ji ber bikaranîna çekên kîmyawî wek binpêkirina hiqûqa navneteweyî hesab ji dewleta Tirk bipirse.

**’Binpêkirinên Tirkiyeyê li dijî kurdan rêbazeke qirkirinê ye’**

Ji ber ku bikaranîna van çekan li gorî bendê 8’ê yasaya Dadgeha Tawanan a Navneteweyî û bi taybetî jî bendên 17 û 18’ê li gorî bendên hiqûqa navneteweyî yên adetî, wekî tawanek şer tê hesibandin, ew hewce dike ku sûcdar ji Dadgeha Cezayê ya Navneteweyî re bêne şandin.



Sîpan Xelef wiha li gotinên xwe zêde kir: “Mixabin dema mijar dibe bikaranîna Tirkiyeyê ji çekên giran û yên qedexe li dijî gelê kurd û Gerîlayên Azadiyê yên kurd, bêdengî çêdibe û ya rastir jî tevlîbûna wan bi Tirkiyeyê re di sûc de, ev yek dihêle ku dewleta Tirk ji bêdengiyê cesaret bigire, gerek binpêkirinên dewleta Tirk di bikaranîna çekên kîmyawî li dijî gelê Kurd weke qirkirina gelê Kurd were naskirin û di dadgihên navnetewî de were dadgehkirin.”

**Divê ji bo eşkerekirina binpêkirinên Tirkiyeyê her kes erkê xwe pêkbîne**

Di dawî de parêzer Sîpan Xelef wiha got: “ Ev mijar exlaqê me eleqedar dike, ji ber vê yekê divê her kes li hemberî eşkerekirina dewleta Tirk, di serî de bijîşk, hiqûqnas, saziyên sivîl û hemû komên çalak erkên xwe bi cih bîne, daxwaza rawestandina bikaranîna çekên qedexe bike û ji dewleta Tirk hesab bixwaze û ji dest kî çi bê divê bê kirin.”

# ‘Em ê dengê xwe bi rengekî demokratîk bi kar bînin’

**Avêsta Menaf/Qamişlo**

**Hevserokê Partiya Kesk a Demokirat Luqman Ehmê diyar kir ku dema hilbijartin hat ragihandin ew ketin tevgerê de û got: “Em ê keda xwe bi rengekî demokiratîk bi kar bînin, êdî pirojeya Rêveberiya Xweser di aliyê siyasî de jî wê were erêkirin, ji ber vê yekê em hilbijartinan wekî têkoşîna ji bona demokrasiyê dibînin.”**

Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê 11’yê Hezîranê hilbijartinên şaredariyan dê pêk werin. Di çarçoveya amadekariyên hilbijartinan de piştî avakirina Komîseriya Bilind a Hilbijartinan, li 125 bajar û bajarokên 7 kantonan lijne hatin avakirin. Di heman demê de 2 blok hatin çêkirin, yek ji wan bilokan girêdayê PYD`e, Partiye Sûriya Pêşeroj û Kongira Star e û hin patiyên din jî bi wan re ne, biloka din jî ji 5 partiyan pêk tê û bi dirûşmeya ‘Bi hevre ji bo çêtirîn raje’ wê tevlî hilbijartina bibin, ji xwe partiyên vê bilokê pêk tînin wiha ne: Partiya Kesk a Dmokirat, Tevgera Nujen a Kurdistanî, Partiya Çep a Demokirat ya Kurd Li Suriyê, Partiya Biratiya Kurdistanî û Yekîtiya Kedkarên Kurdistanê. Her wiha hin partî jî hene



ku tevlî ti bilokan nebûne û bi xwe tevlî hilbijiartinan dibin.
Di hilbijartinan de dê hevşaredar û endamên meclisên şaredariyan bên diyarkirin. Di çarçoveya bilokên hilbijatinan û amedakariyên wê de hevserokê Partiya Kesk a Demokirat Luqman Ehmê ji Rojnemeye me re axivî.
Luqman Ehmê da zanîn ku li Sûriyê ewqas hilbijartin çêdibûn lê bi rengê demokiatîk ne dihat çikirin û wiha got: “Ev cara yekeme ku li ser asta Suriyê hilbijartin bi rengê demokiratîk tê li dar xistin, ji ber ku gelek caran li Sûriyê hilbijatin dihatin li dar xistin lê ne bi rengekî demokirat bû. Her wiha ev cara 3`mîn e ku hilbijartin li bakurê Suriyê tê li dar xistin, hilbijartina yekim di sala 2015`an de bû, hilbijartina 2`yem di sala 2017`an de hat li dar xistin. Di her dû hilbijartinên ku derbas bû, ne bi rengê lîstan bû, her wiha bi rengê kesayetan bû ku daihatin tevlî hilbijatinan dibûn û dengê xwe didan. Ev hilbijartinên niha tecrûba 3`ya ye ji bo Rêveberiya Xweser e, lê erdnîgariya wê berferehtire. Yanî herêmên ku 2017`an ji DAIŞ`ê rizgar bûne ew jî êdî tevlî hilbijartinan dibin. Ji ber vê yekê gelek ji wan hîn naskirina wan di aliyê hilbijartinan tune ye û zehmetiyan dikşînin, ji ber ev tecrûbeya wan ya yekeme. Tiştên heyê ku ev hilbijartin tirafîkeke bilez di nava partiyan de çêkir, di encamê de em wekî Partiya Kesk a Demokirat heya roja îro me hevbendiyekî çêbikin, di destpêkê de em 2 partî bûn, lê her çû zêde bûn, niha jî em 5 partî û cihê xwe li hevbendiya ku me li dar xist digirin. Niha jî hemî lîsteyên hevbendiyê hazirin, her wiha di bin dirûşmeya ‘Em bi hevre ji bo çêtirîn raje’ yanî çêtirîn xizmetguzarî.”

**Astengî û zehmetî**

Luqman di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: “Ji ragihandina hilbijartinan di roja yekemîn de, em ketin tevgerê û têkiliyên me bi partiyên cuda cuda re hatin çêkirin, yên ku tevlî hevbendiyê bûn û xwe bi cih kirin 5 partî ne, heya niha ew jî Partiya Kesk a Dmokirat, Tevgera Nujen a Kurdistanî, Partiya Çep a Demokirat ya Kurd Li Sûriyê, Partiya Biratiya Kurdistanî û Yekîtiya Kedkarên Kurdistanê, di heman demê de me logo û dirûşmeya vê hevbendiyê diyar kiriye. Zehmetî û astengiyê derdikevin li pêşiya me, beramberî komîteyên hilbijartinan yên ku hatina dayîn, gelek ji wan raste rast karê xwe nasnakin û di gelek aliyan de zehmetî tê dîtin. Her wiha di riya mudaxele re hin kêmanî têne sererastkirin û hin ji wan kêmaniye wiha dimînin, rastî niha jî pêwîste zehmetî nekevin pêş de, ji ber ku êdî her kes naskirina wan ji kar re çêbuye û ketiya nava kar û xebatên hilbijartinan de ku tecrubeyek baş hat girtin û dikarin bi rehetî lîsteya xwe pîşkêş bikin. “

**Bilokên ku hatine diyar kirin**

Ehmê bal kişand li ser bilokên ku hatine diyar kirin û wiha got: “Bilokên ku hatine diyar kirin 2 bilokin, yek ji wan bilokan girêdayê PYD`e, Partiye Sûriya Pêşerojê û Kongra Star e û hin patiyên din jî bi wan re ne, biloka din jî ya 5 partiya ne ya bi duruşmeya ‘Bi hevre ji bo çêtirîn raje’ ku Partiya Kesk a Dmokirat, Tevgera Nujien a Kurdistanî, Partiya Çep a Demokirat ya Kurd Li Suriyê, Partiya Biratiya Kurdistanî û Yekîtiya Kedkarên Kurdistanê xwe dinav de digire. Her wiha hin patî jî bi tene serê xwe jî daketine ku bilok çênekirine wiha derbas bûne. Lê belê ji bo partiyên ku tevlîbûne wan di nava hilbijartinan de çêne bûn, ev tê wateya ku naxwazin pirojeya vê Rêveberiyê çêbibe di riya demokiratîk de.”
Luqman Ehmê di dawiya axaftina xwe de diyar kir ku hilbijartin ew jî wekî têkoşîneke leşkerî ye û wiha got: “Ev hilbijartin wekî ku mirov di şerekî leşkerî de ye, yan tu bi ser bikeve yan jî na. Em partî bi rengekî wiha dibînin, ji ber vê yekê çawa ku hilbijartin hat ragihandin em jî ketin tevgerê de, ji ber ku ev kede bi rengekî demokiratîk wê werin dayîn, êdî pirojeya Rêveberiya Xweser ji aliyê siyasî de jî wê were erêkirin, ji ber vê yekê em wekî şerekî dibînin. Her wiha pêwîste komîn her dem vekirî bin û deverên ku nasnemeyên hilbijartinan tên çêkirin hîn zêdetir alî kar bin bi gel re û bi şêwazekî baş nêzî gel bibin. Di herî dawî de ez hêvî dikin ku her kes xwe berpisiyar bibîne û dengê xwe bide hilbijartine û dengê xwe bide ew kesê ku xizmeta wan bike û pirsgirêk denekeve ji aliyê kar û xebatên xizmetguzarî. Ji ber ku gelê me wê 2 sala bi van kesan re jiyan bike û berpisiyariya wan rake.”